

Hejmara - 195

Bê dirave

MIZGÎN

1 - Mijdar - 2025



Naverok

- 1 Wênesazî
- 2 Wêjeya Zarokan
- 3 Lîsk
- 4 Welatê me
- 5 Tu dizanî
- 6 Tendirustî
- 7 Tîp û gotin
- 8 Navdar
- 9 Bexçeyê Navan
- 10 Jîngeh mala me ye
- 11 Jêhatiyên Zarokan
- 12 çîrok
- 16 Bixwînin û fêr bibin
- 17 Çavika Mizgîn

Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Dîzayn
Mecid Alsadûn

Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Baran zagros
Rojhilat




Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

 Kovara Mazgîn

 Kovara Mazgîn مجلة مزكین

اتَّبِعِ الْخَطَّاتِ
التَّالِيَةَ لِرَسْمِ الْقِرْدِ



Bi zimanê xwe bixwîn û binivisîne

Hopanê Hopanê
 Zeriya min Şîlanê
 Şîlanê jiyane
 Keça perîşanê
 Çûye dibistanê
 Bixwîne zimanê
 Zimanê me xweş e
 Wek mewîja reş e
 Tîpên me sî û yek in
 Pî hev lek bi lek in
 Bîst û heft dengdar in
 Ê mayî dengdêr in
 Tîpa A Amara
 Gulek ji hinara
 Tîpa B beyanê
 Wek şitla reyhanê
 Tîpa C Ciwana

Wek pelê qezwana
 Tîpa Ç Çinar e
 Bi toq û guhar e
 Tîpa D delîl e
 Layê hac xelîl e
 Pir şad û kêfxweş im
 Bi wan ez dilgeş im
 Hevalê min pir in
 Dilpak in nebigr in
 Em ji hev hez dikin
 Bi hev re kar dikin
 Welat mê ava kin
 Bi pênuşê şa kin
 Gulên pêşerojê
 Hilkin ala rojê
 Bijî zar û ziman
 Peyama Kurdistan
 ZIMANÊ MIN ŞÊRÎN



Leyla Reşo



أين يعيش هذا الحيوان؟ Ev lawir li ku dijî?

Her lawirekî bighîne jîngeha ku lê dijî

صل كل حيوان بالبيئة التي يعيش فيها





Bajarê Bedlîsê

Bajarekî pir kevnar e ku di navbera pênc geliyan de ye. Zivistanê bi berfê tê nixumandin û biharê jî vediguhere xalîçeyek kesk a fireh ku bi kulîlkên rengîn xemilandî ye. Çemên wê yên piçûk di navbera keviran de diherikin, mîna ku muzîka xwezayî lê bidin. Bajar gelek şûnwarên dîrokî dihewîne, wek Keleha Bidlîsê ya bilind. Bedlîs bi sedan sal navendeke xwendin û çandê bû. Ev bajar bi dibistanên xwe yên kevnar ku xwendekarên ji devrên dûr lê dixwendin, pesnê xwe dide. Hin rêwîyan jî li ser wê nivîsandine û jê re gotine "bajarê pirtûk û zanyaran".

Xelkê Bedlîsê jî çandinî û xwedîkirina sewalan hez dikin. Bazarên wê yên kevin teng in lê tijî jîyan in. Yek ji tiştên herî navdar ên Bedlîsê penîrê Kurdî ye ku bi awayekî kevnepî yê taybetî tê amadekirin û di nav çermên miyan de tê hilanîn da ku teze û xweş bimîne.

مدينة بدليس


مدينة قديمة جداً تقع بين خمسة وديان. في الشتاء تغطيها الثلوج، وفي الربيع تتحول إلى بساط أخضر واسع، تزيينه الأزهار الملونة. أنهارها الصغيرة تسيل بين الصخور، وكأنها تعزف موسيقا طبيعية. والمدينة تضم الكثير من الآثار، مثل قلعة بدليس الشامخة.

منذ مئات السنين، كانت بدليس مركزاً للعلم والثقافة. فيها مدارس قديمة، كان يدرس فيها الطلاب من أماكن بعيدة. حتى أن بعض الرحالة كتبوا عنها، وقالوا: إنها "مدينة الكتب والعلماء". أهل بدليس يحبون الزراعة، وتربية الحيوانات. أسواقها القديمة ضيقة، لكنها مليئة بالحياة؛ وأشهر ما تقدمه بدليس الجبن الكردي المعد بطريقة تقليدية خاصة، يُخزن داخل جلود الغنم؛ ليبقى طازجا ولذيذاً.

Mêşhingiv çawa hingiv çêdike?

كيف يصنع العسل؟

Mêşhingiv ji bo berhevkirina şîravê di navbera kulîlik û gulan de diçin û tên, dûv re vedigerin kewarê û şîravê vediguherînin hingivê parzûnkirî. Hevalên min, bizanibin ku her dilopek hingiv çîroka serpêhatiyê mezin ji bo bidestxistina şîravê, hildigire!



النَّحْلُ يَتَنَقَّلُ بَيْنَ الْأَزْهَارِ
وَالْوُرُودِ، لِيَجْمَعَ الرِّيحِيقَ،
ثُمَّ يَعُودُ إِلَى الْخَلِيَّةِ
وَيُحْوِلُهُ عَسَلًا مُصْفًى.
وَاعْلَمُوا، أَصْدِقَائِي، أَنَّ كُلَّ
قَطْرَةٍ عَسَلٍ تَحْمِلُ قِصَّةَ
مُغَامَرَةٍ كَبِيرَةٍ لِلْحُصُولِ
عَلَى الرِّيحِيقِ!

Ji payizê heya zivistanê

Her ku demsal ji payizê ber bi zivistanê ve diguhere, hewa jî diguhere. Carinan sar e û carinan baran dibare. Û ji ber ku em ji lîstin û xwendinê hez dikin, werin em van şîretan bixwînin:

Dema avhewa sar be cilên germ li xwe bikin, bi taybetî kom û gerdenpêç. Cil û berg we ji sermayê diparêzin. Sêv, porteqal û gêzeran bixwin da ku laşê we vîtamînên pêwîst bistîne. Her dem rûniştî nemînin, ji ber ku tevger gera xwînê çalak dike û we germ dike.




من الخريف إلى الشتاء

مع تغيّر الفصول من الخريف إلى الشتاء، يتغيّر الطقس أيضاً. أحياناً يكون الجو بارداً، وأحياناً تمطر السماء، ولأننا نحب اللعب والدراسة، تعالوا نقرأ هذه النصائح. ارتد ملابس دافئة عندما يبرد الجو، وخاصة القبعة والوشاح. فالملابس تحميك من البرد. تناول التفاح، والبرتقال، والجزر؛ لتحصل على الفيتامينات الضرورية للجسم. لا تبقى جالساً طوال الوقت، لأن الحركة تنشّط الدورة الدموية وتشعرك بالدفء.



أَصْدِقَائِي الْأَعْزَاءَ، أَكْمَلُوا الْحُرُوفَ النَّاقِصَةَ؛ لِتُكْمَلُوا
الْأَسْمَاءَ حَسَبَ صُورِهَا.





Şukrî Hena Cermoklî Alamedî

شكري حنا جرموكلي الأمدي

Şukrî di sala 1909'an de li bajarê Amedê li Bakurê Kurdistanê ji dayik bû. Ji temenê biçûk ve, ji xwendinê hez dikir û xeyal dikir ku bibe mamosteyek û zarokan fêr bike.

Piştir ew çû bajarê Qamişlo da ku wekî mamoste bixebite, wî dibistanên Suryanî ava kir. Wî ne tenê wane da, lê di heman demê de alîkariya vekirina refên perwerdeyê yên keçan jî kir, wî bawir dikir ku keç jî mîna kuran xwedî mafê perwerdeyê ne.

Ji bo wî, perwerde bi tenê di refan de sînordar nebû! Berevajî vê, wî zarok û ciwan teşwîq dikirin ku tîmên keşfê yên li ser lîstik û çalakiyên komî yên xweş disekin, ava bikin. Da ku fêrî ziman û çanda xwe ya Suryanî bibin. Herwiha wî tîma Alrafîdên a sporê ava kir.

وُلِدَ شكري 1909 في مدينة آمد في باكور كردستان. منذ صغره أُحِبَّ الدَّرَاسَةَ، وَكَانَ يَحْلُمُ، أَنْ يُصَبِّحَ مُعَلِّمًا يُسَاعِدُ الْأَطْفَالَ عَلَى التَّعْلَمِ. ثُمَّ انْتَقَلَ إِلَى مَدِينَةِ الْقَامِشْلِيِّ لِيَعْمَلَ مُعَلِّمًا، ثُمَّ أَسَّسَ مَدَارِسَ سُرْيَانِيَّةً. وَلَمْ يَكْتَفِ بِالتَّدْرِيسِ فَقَطْ، بَلْ سَاعَدَ عَلَيَّ فَتَحَ صُفُوفٍ لِلبَنَاتِ أَيْضًا، لِأَنَّهُ كَانَ يُؤْمِنُ أَنَّ الْبَنَاتِ مِثْلَ الْأَوْلَادِ لَهِنَّ الْحَقَّ فِي التَّعْلَمِ. لَمْ يَكُنِ التَّعْلِيمُ عِنْدَهُ مُحْصُورًا دَاخِلَ الصُّفُوفِ! بَلْ شَجَّعَ الْأَطْفَالَ وَالشَّبَابَ عَلَى تَكْوِينِ فِرَقٍ كَشْفِيَّةٍ، تَعْتَنِي بِاللَّعْبِ وَالنَّشَاطَاتِ الْجَمَاعِيَّةِ الْمُمْتَعَةِ، لِتَعْلَمَ لَغَتَهُمْ وَثِقَافَتَهُمُ السُّرْيَانِيَّةً. وَأَسَّسَ نَادِيَ الرَّافِدِينَ الرِّيَاضِي.

**Hin Navên
bi tîpa -Z**

Zana

Zagros

Zara

Zanyar

Zarîn

Zarbîn

Zaxo

Zerîn

Zêrevan

Di payîzê de, pelên daran dest bi guhertina rengê xwe ji kesk dikin zer, porteqalî û sor. Mîna ku xweza wêneyekî xweşik ji me re çêbike berî ku zivistan were.

Di payîzê de çi dibe?

Pelên daran hildiweşin da ku dar enerjîya xwe di zivistanê de biparêze. Fîrînde ber bi cihên germ ve koç dikin. Lawir xwarinê kom dikin û dikevin xewa zivistanê ya dirêj.

Em çawa di payîzê de jîngeha xwe diparêzin?

Ji bo ku av qirêj nebe, pelan neavêjin çem.

Pelên xwe di nav axê de bi cih bikin da ku bibe xwarina xwezayî ji bo şînatîyan. Ji ber ku ew pel di nava axê de tîndî hilandin, kanza û xweyên kanzayê didin axê, herwiha alikariya şînatîyan dike ku di buharê de ji nû ve şînan bibin.

في الخريف، تبدأ أوراق الأشجار بتغيير ألوانها من الأخضر إلى الأصفر والبرتقالي والأحمر. وكأن الطبيعة ترسم لوحة جميلة، فنستمتع بها قبل حلول الشتاء. فماذا يحدث في الخريف؟

تسقط أوراق الشجر للمحافظة على طاقتها في الشتاء. تهجر الطيور إلى أماكن دافئة. تحزن الحيوانات الطعام؛ فتدخل في سبات شتوي طويل. كيف نحافظ على بيئتنا في الخريف؟

لا ترم أوراق الشجر في النهر؛ حتى لا تتلوث المياه. صغ الأوراق في التربة؛ لتصبح غذاءً طبيعيًا للنباتات.

لأن الأوراق المتساقطة تتحلل، وتعيد للتربة المعادن، والأملاح؛ لتساعد النبات على النمو من جديد في فصل الربيع؟

P
A
Y
Î
Z



الخريف

Mihemed Rênas Tahir

Zarokekî ji gundê Dêrokevnikê ye, ew refa sêyem a seretayî dixwîne. Xeyalên wî geş in, cîhana xwe bi serpêhatî û xewnên xweşik tijî dike.

Hobiya wî ya bijartî ajotina bisiklêt e. Ew her roj xwe perwerde dike û xeyal dike ku bi bisiklêta xwe biçê her bajarê cîhanê da ku bi şampiyonan re beşdarî pêşbirkên girîng bibe. Ew herwiha hêvî dike ku dibistana wî pêşbirkek bisiklêtan li dar bixe da ku ew bikaribe bi hevalên xwe re beşdar bibe û giyanê serpêhatiyê hîs bike.

Ew hîz dike ku bisiklêta wî ne tenê bisiklêteke asayî ye, lê belê vediguhere keştîyeke fezayî, di nav ewran de difire û digihîje stêrkan. Dema ku çavên xwe digire, ew dibîne ku bi bisiklêta xwe heyvê derbas dike, destê xwe ji gerstêrkan yek bi yek re liba dike û bi stêrkên geş ên li ezman re pêşbirkê dike.



محمد ريناس طاهر

طفلٌ من قريةٍ دير وكفناك، يدرس في الصفِّ الثالث الابتدائيِّ. عنده خيالٌ واسعٌ جدًّا، يجعلُ عالمه مليئًا بالمغامراتِ، والأحلامِ الجميلةِ.

هوايتهُ المفضَّلةُ ركوبُ الدراجةِ. يدرِّبُ نفسه كلَّ يومٍ، ويحلمُ أن يسافرَ بدراجتهِ إلى كلِّ مدنِ العالمِ؛ ليشاركَ في مسابقاتٍ مُهمَّةٍ معَ الأبطالِ. ويتمنَّى أن تُنظِّمَ مدرستهُ أيضًا سباقًا للدراجاتِ؛ كي يشاركَ معَ أصدقائهِ، ويشعَرَ بروحِ المغامرةِ.

وهو يظنُّ دراجتهِ ليستَ عاديةً، بل تتحوَّلُ مركبةً فضائيَّةً، تطيرُ بينَ الغيومِ، وتصلُ إلى النجومِ. حينَ يغمُضُ عينيه، يرى نفسه يمزُ بدراجتهِ جانبَ القمرِ، يلوِّحُ للكواكبِ واحدًا واحدًا، ويُسابقُ النجومَ المضيئةَ في السَّماءِ.



Çîroka : Mîhrecana Cilûbergan

Hevalên hêja, îro
bûyereke dîrokî
heye...Pêşandana
cilûbergên daristanê a
mezin!

Ohhhhh! Em
dixwazin
modelan
bibînin.

Va ez bi
hemû
şengiya xwe.

Kum li serê te
wekî bişkovkekê
ye hahahahah.


Immm...Çima
naghêje heta
nîvê stûyê min?


Pêwêstiya te bi
gerdenpêçeke bi
dirêjahiya dara
xurman, heye.

Binêrin.... Ez
modeleke
profesyonel im.

Na, tu medeleke
ketinê yê
profesyonel e
hahahah







Hevalên min,
hûn pir
henekbaz û
şeng in... lê
modela herî
xweşik ew e
ku em wekî
xwe bin.



(Medela herî xweşik ...Em
wek xwezaya xwe bin)



Goştforoş
بَرَازُ
butcher



Nanpêj
خَبَّازُ
Baker



Hesinkar
حَدَّادُ
Blacksmith



Kaşîker
مَبْلَطُ
Tiler

Çavika Mizgîn

عدسة مزكين



مركز

1 - تشرين الثاني - 2025

